# Bultena heftane

# 5/8/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## Dîana Taurasî bû basketbolbaza yekem

Basketbolbaza jin Dîana Taurasî di tîma lîga basketbola jinan a Amerîkayê Phoneix Mercury de forma li xwe dike, di dîroka lîgê de bûye jina yekem a basketbolbaz ku benda 10 hezar derbas kir.

https://jinhaagency1.com/ku/werzis/diana-taurasi-bu-basketbolbaza-yekem-40272

Çavkanî:JINHA




## Li Haîtiyê revandina jin û zarokan gihiştiye astek bilind

NAVENDA NUÇEYAN - UNICEF'ê ragihand ku li Haîtî bûyerên revandina jin û zarokan di 6 mehan de gihiştiye astek bilind û xwest mudaxaleyî vê rewşê bê kirin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215689

Çavkanî:JINNEWS



# Pirtûka 2 jinên Skoç a li ser Şoreşa Rojava hate nasandin

Jenni Keasden û Nataila Szarek ên ji Skoçyayê, pirtûka ku li ser Şoreşa Rojava nivîsîn bi kombûnekê dan nasandin. Her wiha qala tecrûbeyên xwe yên li qada şoreşê kirin.

https://anfkurdi.com/ewropa/pirtuka-2-jinen-skoc-a-li-ser-Soresa-rojava-hate-nasandin-172534

Çavkanî:ANF



**Rojhilata navîn**

# Jinên Xezayê: Werzîş ne luksek e pêwîstiyek e

Jinên di nava civaka Xezayê de li dijî hişmendiya ku werzîşê li gorî jinan nabîne, werzîşê berdewam dikin dibêjn ku divê jin li dijî zextan, werzîşê berdewam bikin û bang dikin ku ji bo jiyana bi tendirust jin hemû berê xwe bidin werzîşê.

https://jinhaagency1.com/ku/werzis/jinen-xezaye-werzis-ne-luksek-e-pewistiyek-e-40268

Çavkanî:JINHA




# Li Afganistanê 'Rêya Mirinê' bûye şahidê qetilkirina bi sedan ciwanan

Riya navenda eyaleta Vardak a Afganistinê ku weke 'riya mirinê' tê zanîn, bûye şahidê qetilkirina bi sedan ciwanan.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-afganistane-reya-mirine-buye-sahide-qetilkirina-bi-sedan-ciwanan-40267

Çavkanî:JINHA



## Radhia Jerbi: Rewşa jinên Tûnisî ji hêviyan dûr e

Seroka Yekitiya Neteweyî ya Jinên Tûnisê Radhia Jerbî got ku serokwezîra bere Najlaa Boudin, jinek wêrek bû ji ber ku di heyamek dijwar de serokwezîriyê kiriye.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/radhia-jerbi-rewsa-jinen-tunisi-ji-heviyan-dur-e-40266

Çavkanî:JINHA



## Di sêgoşeya ol, dewlet, zayendparêziyê de jin: Çareserî Konfederalîzma Jinan a Cîhanî

Endama TJK-E Zîlan Diyar, êrîşên olperest, netewperest û zayendperest ên li Rojhilata Navîn û hemû cîhanê bi aqilê mêr-dewletê li dijî jinan tên kirin nirxand û bal kişand ser girîngiya Konfederalîzma Jinan a Demokratîk.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/di-segoseya-ol-dewlet-zayendpareziye-de-jin-Careseri-konfederalizma-jinan-a-cihani-40263

Çavkanî:JINHA



## Heta 15 salan cezayê girtîgehê ji Halîse Aksoy re hat xwestin

Îdianameya der barê Halîse Aksoy a ku hestiyên kurê wê di qutiya kargoyê de teslîmê wê hatibûn kirin bi îdiaya ‘ji bo endamên rêxistinê diyarkirina malên pê bawer’ heta 15 salan cezayê girtîgehê hat xwestin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/heta-15-salan-cezaye-girtigehe-ji-halise-aksoy-re-hat-xwestin-40270

Çavkanî:JINHA



## Di dadgehên Îranê de ji bo kesên ku hicaba ferzkirî red dikin teşhîsa 'pirskirêka derûnî'!

Komeleyên tendirustiya derûnî bertek nîşanî biryarên “nexweşiya kesayetî dij-civakî” ya dadgehên ku li Îranê ji bo jinên hîcab bikarnaynîn dan û gotin, “Tespîtkirina nexweşiyên derûnî ne li ser milê dadgeriyê ye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/di-dadgehen-Irane-de-ji-bo-kesen-ku-hicab-ferzkiri-red-dikin-teshisa-nebasiya-deruni-40271

Çavkanî:JINHA



## Di doza destdirêjiya jina ji sedî 73 astengdar de hat gotin ku "riza"wê heye

Dadgeha Îzmîrê bersûcên ku di doza destdirêjiya ya li dijî jineke ji sedî 73 astengdar ye, bi hinceta ku jin “riza” wê heye beraat kir.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/di-doza-destdirejiya-jina-ji-sedi-73-astengdar-de-hat-gotin-ku-riza-we-heye-40259

Çavkanî:JINHA




## 6'ê Tebaxa 2021'ê: Meşa li dijî kuştina jinan

Koma Kampanyaya Sepandina Peymana Stenbolê, li dijî kuştina Azra Gulendam Haytaoglu, Esra Hankulu, Emîne Gokkiz û yên din ji Kafeya Mor a Kadikoya Stenbolê heta Qada Rihtimê meşiyan. Li vir bi daxuyaniyekê kuştina jinan şermezar kirin û gotin hem kujeran nas dikin û hem jî kesên ku parastina kujeran dikin nas dikin

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215570

Çavkanî:JINNEWS



## [Zîhniyeta serdest a êrişî xweza û jinan dike](http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215572)

MUGLA - Jinên tevli berxwedana Akbelenê bûn diyar kirin ku êrişa li hember xwezayê bi êrîşa li hember çanda jinê re heman e û ji heman tiştî pêk tê. Jinan li ijî serdestiya mêr banga têkoşîna yekbûyî kir.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215572

Çavkanî:JINNEWS




## Kovara Jinê bi manşeta 'Hem birîn hem jî şîn didome' derket

STENBOL - Kovara Jinê di berga xwe ya vê hefteyê de cih da Fermana 74'an a li dijî êzidiyan û bi manşeta "Hem birîn hem jî şîn didome" derket.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215586

Çavkanî:JINNEWS



# Talîban ji bo zarokên keç perwerde qedexe kir!

NAVENDA NÛÇEYAN - Hat hînbûn ku li Afganîstanê Talîban li hinek bajaran ji bo zarokên keç yên di ser pola sêyemîn de biçin malên xwe talimat dane midûrên dibistanan.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215603

Çavkanî:JINNEWS



# Jinên TJA'yê diyanet protesto kirin

ŞIRNEX - Li Sîlopiyê jinên TJA'yê, daxwaza Diyanetê ya ji bo tevlibûna Doza Kobanê bi gotina 'Hûn nikarin li pêş têkoşîna me ya mafdar bibin asteng' protestor kirin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215600

Çavkanî:JINNEWS



# Di meha tîrmehê de 26 jin hatin qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li gorî çeteleya tundiyê ya meha tîrmehê ya ajansa me JINNEWS'ê 26 jin û 2 zarok hatine qetilkirin û 9 jin û 4 zarok bi guman jiyana xwe ji dest dane.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215616

Çavkanî:JINNEWS




# Li Rojhilat û Îranê 165 jin hatin qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li gorî nûçeya Rojnameya Sarkê ya Rojhilat û Îranê, mêran di du salên dawî de 165 jin qetil kirine.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215636

Çavkanî:JINNEWS




## Li Rihayê di qenala avdanê de cenazeyê jinekê hate dîtin

RIHA - Li Rihayê di qenala avdanê ya DSÎ'yê de cenazeyê jinekê hate dîtin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215645

Çavkanî:JINNEWS




## Li Helebceyê dayikek û keça xwe şewitîn

Li Helebceyê dayikeke û keça xwe di mala xwe de bi giranî şewitîn, polîs jî dibêjin ji ber jêçûyîna xazê agir bi mala wan ketiye û ew şewitî ne.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/li-helebcey-dayikek-keca-xwe-sewitn-h77084.html

Çavkanî:ANHA



## Li Rihayê jinek hate qetilkirin

Li navçeya Sêwereg a Rihayê Esma Kalenderlî ji aliyê Mûrat Otuş ve ku dest ji hev berdabûn, hate qetilkirin.

https://anfkurdi.com/jin/li-rihaye-jinek-hate-qetilkirin-172402

Çavkanî:ANF




## Kiryarê destdirêjiya li dijî 45 zarokan hat xelatkirin!

Li Karamanê der barê sê rêveberan de têkildarî bûyera 45 zarokên ku li Weqfa Ensar rastî tecawizê hatibûn, vebûbû de yek ji wan jî Asim Sultanoglu bû, ji bo Muduriyeta Perwerdeyê ya Rihayê hat tayînkirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/kiryare-destdirejiya-li-diji-45-zarokan-hat-xelatkirin-40284

Çavkanî:JINHA



# [Çalakvana Mexrîbî: Divê tora têkoşîna hevpar a jinan were avakirin](https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/Calakvana-mexribi-dive-tora-tekosina-hevpar-a-jinan-ava-bibe-40286)

Çalakvana siyasî Hayat Boufrachen diyar kir ku ji bo pêşî li hemû şêwazên tundîtûjî û cihêkariyê bigrin û parastina mafên jinên Mexribê mîsoger bikin divê tora têkoşîna hevpar a jinan were avakirin.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/Calakvana-mexribi-dive-tora-tekosina-hevpar-a-jinan-ava-bibe-40286

Çavkanî:JINHA




# [Baweriya jinan bi saziyên dewletê nayê](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/baweriya-jinan-bi-saziyen-dewlete-naye-40287)

Navenda Lêkolîna Qadê ya sosyopolîtik xebata der barê tundîtûjiya li hemberî jinan de daye meşandin eşkere kir. Li gorî lêkolînê ji sedî 94,2'ê jinan der barê çareseriya tundiya ku li wan tê kirin de diyarkirin ku baweriya wan bi saziyên dewletê nayên.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/baweriya-jinan-bi-saziyen-dewlete-naye-40287

Çavkanî:JINHA



# [Mamostayan li Helebce bi daxwaza mafên xwe çalakî lidarxistin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/mamostayan-li-helebce-bi-daxwaza-mafen-xwe-calaki-lidarxistin-40290)

Mamostayên Helepce yên bi peyman ji bo bi awayek fermî tayîn bibin li ber wezareta perwerdeyê çalakiya nerazîbûnê li darxistin. Mamosteyan diyarkirin ku heta sala nû ya xwendinê daxwazên wan neyê bicih anîn wê baykota xwendinê bikin.

[https://jinhaagency1.com/ku/rojane/mamostayan-li-helebce-bi-daxwaza-mafen-xwe-calaki-lidarxistin-40290](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/mamostayan-li-helebce-bi-daxwaza-mafen-xwe-calaki-lidarxistin-40290)

Çavkanî:JINHA




# [Bêrîvan ji ber qedexekirina zozanan her roj 3 saet rê diçin!](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/berivan-ji-ber-qedexekirina-zozanan-her-roj-3-saet-re-dicin-40296)

Bêrîvanên ku zozanên wan hatine qedexekirin her roj 3 saet di riyên berqef, bi xwelî û xirabe de diçin û tên. Bêrîvan, pereyê ku ji şîrê pez qezenc dikin jî li traktora ku pê diçin û tên xerc dikin û dixwazin edexeya li ser zozanê wan were rakirin.

[https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/berivan-ji-ber-qedexekirina-zozanan-her-roj-3-saet-re-dicin-40296](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/berivan-ji-ber-qedexekirina-zozanan-her-roj-3-saet-re-dicin-40296)

Çavkanî:JINHA



# [Gendelî, qedexe, nakokî: Zarokên Afgan bi salan ji xwendinê bêpar man]

Li parêzgeha Wardak a Afganîstanê, gendeliya hikûmeta berê, qedexe û zextên Talîbanê û pevçûnên ku berdewam dikin zarokan ji xwendinê dûr dixe.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/gendeli-qedexe-nakoki-zaroken-afgan-bi-salan-ji-xwendine-bepar-man-40297

Çavkanî:JINHA




# ['Tavilê pêşî li ber cînayetên jinan bigirin!']

RIHA - Platforma Jinan a Rihayê û Baroya Rihayê destnîşan kirin ku ger rayedaran peywira xwe pêk bianiyana dê Esma Kalenderlî ji hêla mêrê dest jê berdabû ve nehata kuştin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215695

Çavkanî:JINNEWS




## Bi muzîkê zimanê kurdî didin jiyîn

WAN - Rêvebera Kargeha Çand û Hûnerê ya Aryenê Fadîme Polat, anî ziman ku ew perwerdeya wêne, muzîk û şanoyê bi zimanê kurdî didin û got: "Xwedîderketina li ziman ne tenê bi axaftinê bi rêya xebatên çand û hunerê jî dikare bê kirin. Em dixwazin koma xwe ya jinan mezin bikin û komek mayînde ava bikin. Xwedî li zimanê xwe derkevin."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215671

Çavkanî:JINNEWS



## Zozanên Colemêrgê bi jinan geş dibin

Li zozanên Colemêrgê û pergala dayikê lê serwer e, jin hem di nava xwezayê de ne hem jî ji aliyê hilberîn ve xwedî biryar in.

https://anfkurdi.com/civak-ekolojI/zozanen-colemerge-bi-jinan-ges-dibin-172482

Çavkanî:ANF



## Li Silêmaniyê jineke ciwan hate qetilkirin

Li bajarê Silêmanî yê Başûrê Kurdistanê bi kêran êrîşî jineke ciwan hate kirin. Piştî ku vê jina ciwan rakirin nexweşxaneyê, jiyana xwe ji dest da.

https://anfkurdi.com/jin/li-silemaniye-jineke-ciwan-hate-qetilkirin-172471

Çavkanî:ANF




## Mala xwe veguherand baxçeyê gulan

Behiye Kerîm a li gundê Gamêş Tepeyê sînorê Seyîdsadiq dijî mala xwe veguherandiye baxçeyê gulan.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/mala-veguherand-baxceye-gulan-40315

Çavkanî:JINHA



## ‘Gotinên netewperest ên hikûmetê tundiya li ser koçberan zêde dike’

Çalakvana femînîst Sîham Sasî bal kişand ser jinên koçber ên ku li Tûnisê rastî cihêkarî û tundiyê tên û got: “Gotinên hikûmetê yên netewperest û polîtîkayên wan bingeha vê yekê ava dikin.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/gotinen-netewperest-en-hikumete-tundiya-li-ser-kocberan-zede-dike-40316

Çavkanî:JINHA



## Dayika Aştiyê Remziye Ekenek jiyana xwe ji dest da

Dayika Aştiyê Remziye Ekenek a 82 salî ev demeke dirêj bû nexweşiyên wê hebûn, jiyana xwe ji dest da.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/dayika-astiye-remziye-ekenek-jiyana-xwe-ji-dest-da-40320

Çavkanî:JINHA



## Pinar Yilmaz: Sûcên li dijî jinan tên veşartin

Pinar Yilmaz a ÎHD'î bal kişand ku li Colemêrgê sûcên li dijî jinan carna ji aliyê darazê ve carna ji aliyê cerdevanan ve carna jî ji aliyê malbatan ve tên veşartin û got ku bêdengiya li dijî van bûyeran dê heta kengê bidome! Bi vê şîdet meşrû dibe.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/pinar-yilmaz-sucen-li-diji-jinan-ten-vesartin-40328

Çavkanî:JINHA



## 10 sal cezayê girtîgehê li du çalakvanên jin hat birîn

NAVENDA NÛÇEYAN - Dadgeha Îstînafê ya Tehranê cezayê 10 sal girtîgehê li du çalakvanên Behaî Mahoş Şehriyarî û Ferîba Kamalabadî birî.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215785

Çavkanî:JINNEWS



## Îbrahîm Reîsî gefa 'hicabê' li jinan xwar

Serokkomarê Îranê Îbrahîm Reisî, gef li jinên ku li welat hîcaba ferzkirî red dikin xwar û got: 'Belavkirina derxistina hicabê wê were rawestandin.'

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/Ibrahim-reisi-gefa-hicabe-li-jinan-xwar-40353

Çavkanî:JINHA



## Nameyên girtiyan bi hêceta 'ewlehiyê' tên desteserkirin

Girtiya bi navê Nûrcan Aslan a ku li Girtîgeha Tîpa T a Tarsûsê tê girtin, destnîşan kir ku nameyên ji bo ÎHD'ê dişînin jî bi hinceta 'ewlehiyê' tên desteserkirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/nameyen-girtiyan-bi-heceta-ewlehiye-ten-desteserkirin-40352

Çavkanî:JINHA



## [‘Li dijî peymana Lozanê, jin pêşengiya têkoşînê dikin’](https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/li-diji-peymana-lozane-jin-pesengiya-tekosine-dikin-40351)

Çalakvan Niyaz Abdullah a beşdarî konferansa li ser peymana Lozanê ya li Swisreyê hat lidarxistin bû, bal kişand polîtîkayên qirkirinê yê bi peymana Lozanê hat destpêkirin û got “Li dijî peymana Lozanê, jin pêşengiya têkoşînê dikin.”

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/li-diji-peymana-lozane-jin-pesengiya-tekosine-dikin-40351

Çavkanî:JINHA



## [Saziya Ganoubia Houra li dijî tundî û cihêkariyê têdikoşe](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/saziya-ganoubia-houra-li-diji-tundi-u-cihekariye-tedikose-40346)

Ji ber rewşa heyî ya li cîhanê gelek xebat ji bo jinan pêwîst in, bi taybetî li parêzgeha Aswan a di bin sîstema eşîrtiyê de lê saziya Ganoubia Houra qadên ewle ji bo jinan ava kiriye ji bo li dijî tundiyê rawestin.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/saziya-ganoubia-houra-li-diji-tundi-u-cihekariye-tedikose-40346

Çavkanî:JINHA



## Projeya 'Nanê Mala Me' ji bo jinan derfetê kar ava dike

Nagham Ghattas a Filistînî bi israr û keda xwe di nav dorpêçê de yekem car li Şirîda Xezayê Proje bi navê "Nanê Mala Me" ava kir û bi vê projeyê ji bo jinan derfetê kar avakir.

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/projeya-nane-mala-me-ji-bo-jinan-derfete-kar-ava-dike-40345

Çavkanî:JINHA



## Li Antalyayê jinek hat qetilkirin

ANTALYA -  Li navçeya Serîk jina bi navê Elîf Bayat ji aliyê mêrê pê re zewicandî Ercan bayat ve hat bi çekê qetilkirin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215795

Çavkanî:JINNEWS



## Li dijî malbata rojnameger Rûken Tuncel êrîşa nijadperest

Li Stenbolê kesên ku êrîşê malbata rojnameger Rûken Tuncel kirin bi gotinên; “Dewlet “ez im, polîs ez im. Em Trabzonî ne, em ê we bişewitînin” malbatê tehdît kirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-diji-malbata-rojnameger-ruken-tuncel-erisa-nijadperest-40370

Çavkanî:JINHA



## Komeleya Jinan di her warî de xebatên serkeftî didomîne

Komeleya jinan a li Misirê di warê aborî civakî û siyasî de ji bo jinên Misrî gelek xebatan dide meşandin. Seroka meclisa komeleyê Huda Awarî diyar kir ku hemû enerjiya xwe ji bo qedexekirina sinetkirina jinan xerc dikin.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/komeleya-jinan-di-her-wari-de-xebaten-serkefti-didomine-40365

Çavkanî:JINHA



## [Wênesazên Lîbyayî bi hunerê re pirsgirêka jinan tînin ziman](https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/wenesazen-libyayi-bi-hunere-re-pirsgireka-jinan-tinin-ziman-40362)

Wênesazên ciwan ên li Lîbyayê armanc dikin ku tundiya li dijî jinan û zordariya baviksalarî ya ku di bin navê kevneşopiyê de tê ferz kirin, bi tabloyên xwe hişyariyê bidin.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/wenesazen-libyayi-bi-hunere-re-pirsgireka-jinan-tinin-ziman-40362

Çavkanî:JINHA



## [Nejla Kurul: Hewl didin ji nû ve bîrdoziya 'lîstika zewacê' ava bikin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/nejla-kurul-hewl-didin-ji-nu-ve-birdoziya-listika-zewace-ava-bikin-40360)

Seroka Giştî ya Egîtîm Senê profesor Dr. Nejla Kurul, têkildarî mijara 'dibistanên keçan' a di rojevê de got ku şîdeta li dijî jinan, bi dibistanên yekzayendî, bi sorkirina mêrîtiyê û bîrdoziya lîstika zewacê dibe ku zêde bibe.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/nejla-kurul-hewl-didin-ji-nu-ve-birdoziya-listika-zewace-ava-bikin-40360

Çavkanî:JINHA



**Nûçeyên herêmî**

## Armanca Selwa Al-Bekkar ew e ku atolyeya xwe mezin bike

Selwa Al-Bekkar a 65 salî li bajarê Minbicê di atolyeya ku vekiriye de lîfa têla bafun hildiberîne, niha dixwaze atolyeya ku tê de dixebite mezin bike û makîneyên nû bîne, derfetên kar ji bo jinan ava bike.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/armanca-selwa-al-bekkar-ew-e-ku-atolyeya-xwe-mezin-bike-40269

Çavkanî:JINHA



## Cenazeyê jinekê hat dîtin

Li bajarê Hesekê jinek li mala xwe kuştî hat dîtin.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/cenazey-jinek-hat-dtin-h77041.html

Çavkanî:ANHA



## Bi çêkirina neqşên li ser cilan çanda xwe diparêze

Cemîla Musa ya 49 salî ya ji Kobanê ye bi çêkirina karên destan û neqşên rengîn ên bi motîfên Kurdî him debara xwe dike him jî parastina çandê dike. Cemîle Musa ji bo parastina çanda Kurdî bang li ciwanan kir.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/bi-cekirina-neqsen-li-ser-cilan-canda-xwe-dipeze-40280

Çavkanî:JINHA



## Li Efrînê destdirêjî li 3 jinan hate kirin

Hat zanîn ku komên paramîlîter ên girêdayî dewleta Tirk li navçeya Bilbilê ya Efrînê destdirêjî li 3 jinan kiriye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-efrine-destdireji-li-3-jinan-hate-kirin-40281

Çavkanî:JINHA



## Bi hûnera xwe ya li ser dîwaran Qamişlo rengîn dikin

Group Orchid a xebatên grafîtî dike, hûnera xwe li ser dîwarên Qamişlo dineqişîne. Yasmîn Îbrahîm a di nav koma grafîtî de cihê xwe digre dibêje ku armanca me ew e ku bajarê xwe rengîn bikin û şopek neçûyî lê bihêlin.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/bi-hunera-xwe-ya-li-ser-diwaran-qamislo-rengin-dikin-40293

Çavkanî:JINHA



## Li Idlibê jin ji mafên xwe yê mîrasê bêpar tên hiştin

Jinên Idlibê di warê mafê mîrasê de rastî gelek astengiyan tên ku ev yek ji mîrateyên civakî yên neyênî ye. Bi hinceta li gorî şerîet û zagonê wan lewaz dihêlin û mafên wan ji wan digrin.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/li-idlibe-jin-ji-mafen-xwe-ye-mirase-bepar-ten-histin-40317

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Şoreşê bi diyarkirina zagonan mafên xwe diparêzin](https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/jinen-Sorese-bi-diyarkirina-zagonan-mafen-xwe-diparezin-40330)

Jin di warê şoreşê de bi asoyên fireh, jineolojî, bi cewhera rast, prensîb û zagonên taybet ên jinan û zagona malbatî ku mafên jinan diparêze, ava kirine.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/jinen-Sorese-bi-diyarkirina-zagonan-mafen-xwe-diparezin-40330

Çavkanî:JINHA





## [Jinên bi nivîsandinê êş û têkoşîna xwe vedibêjin](http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215776)

ŞEHBA - Jinên li Şehbayê yên tevî hemû zehmetiyên koçberiyê, bi nivîsandinê hestên xwe tînin ziman wiha gotin:"Encax em bi nivîsandinê dikarin hestên xwe yên êş, têkoşîn, hezkirin û bextewariyê binivîsin. Tevî şertên koçberiyê yên dijwar jî em dev ji pênûsa xwe bernadin."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/215776

Çavkanî:JINNEWS



## Bi pêvajoyên şer re nivîsandina prensîbên jin û sepandina wê

Hevseroka Meclisa Zagonsaz a Herêma Cizîrê Ariya Mele Ehmed got ku cara yekem e li Rojhilata Navîn û giştî cîhanê jin bi xwe prensîb û zagonên ku di warê hiqûqî û zagonî de mafên wan diparêze, dinivisînin.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/bi-pevajoyen-ser-re-nivisandina-prensiben-jin-u-sepandina-we-40342

Çavkanî:JINHA



## Li Hesekê jinek hat qetilkirin

Li Taxa Ezîziyê a bajarê Hesekê jinek bi navê Nexem Diyab El Nezal hat qetilkirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-heseke-jinek-hat-qetilkirin-40364

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

12/8/2023